 

Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 33**

## 5 - Qonaxên şoreşa Babekê Xûramî

Şoreşa *Babekê Xûramî* şoreşeka gelêrî bû û bi rêveberiyeka niştîmanî bû. Armancên wê jî niştîmanî bûn û dûr bû ji dijberiya navbera *Sunne û Şî'e*. Ev şoreş ji şoreşên *Xûramiyan* ya here demdirêj bû. Têkoşîna çekdarî ya vê şoreşê 18-salan berdewam kir. Bi dirêjahiya van salan, şoreşger li dijî leşkerên here bihêz yên *Dewleta Ebbasî* rawestiyan. Şoreş li herêmên gelek fireh belav bû; seranserê Azerbeycanê, zorbeya herêmên rojhilatê Kurdistanê û rojhilatê Ermîniya girte nav xwe. Kurd û Deylemî jî di nav wan da piraniya rûniştivanên van herêman bûn.

Bûyerên vê şoreşê di du qonaxan ra derbas bûn.

### Qonaxa yekem:

Vê qonaxê ji salên 201-218-ê goçî (816 - 833-ê z.), di dema xelîfeyê Ebbasî *El-Me'mûn* kurê *Harûn El-Reşîd* da destpêkir. Rola herêmên çiyayî roleka erênî bû di serkeftinên şoreşgeran da. Wan xwe di çiyayên asê da, çiyayên bi mêşe û daristan da diparast; dûrî Bexdadê (paytextê xîlafetê). Leşkerên Ebbasiyan ji nawendên qût û xurdemeniyê dûr bûn û şoreşgeran êriş dibirin ser karwanên xurdemeniya leşkerê Ebbasî û bi dest xwe va dihanîn. Wan di welatê xwe da, li nêziya nawendên qût û xurdemeniyê şerdikir, rê û derbên çiyayên xwe baş nasdikirin û di şerên çiyayan da xwedî serboriyên demdirêj bûn.

Rêveberê ciwan *Babekê Xûramî* xwedî behremendî û hunerên leşkerî bû, taktîkên cuda û têvel diafirandin ku serkftinan pêkbîne. Wî leşkerê xwe bir bi bir beşkiribû, her birek ji wan ji aliyê rêberekî zexim û betîn va dihate birêvebirin. Şervan ticaran li cihekî taybet demeka dirêj ranediwestiyan; herdem cihê xwe diguhartin. Wan ji cihên xwe yên bilind da û li bihur û geliyên teng êriş dibir ser leşkerên dijmin û karwanên wan yên xurdemeniyê; şerên bi lez dikirin û kelahên dijmin, nawendên wan diroxandin û vedikişiyan warên xwe yên asê. Leşkerên xîlafetê nedikarîn bidin pey wan. Ev taktîkên leşkerî bi xwe ne ku şervanên Kurd

di piraniya şoreşên xwe da di sedsalên 19-an û 20-an da jî bikar anîne û di dema niha da bi navê şerê gerîlatî tê naskirin(1).

Wek her car, dîroknivîsên serdariya Ebbasî *Babek* sûcdar kirin ku kuştin û serjêkirinan pêktîne. Ev sûc û tawanbarî bi xwe ne, ku dijminan bi şoreşgerên Kurd va di sedsala 20-an da jî zeliqandine. Lê belê rastî ewe ku şervanên *Xûramî* ji kuştin û xwînrijandinê nefret dikirin, tenha ji neçarî û ji bo parastina xwe leşkerên dijmin dikuştin. Ji ber ku, li gor baweriya *Yezdaniyê* kuştin nahêle ku giyan bigihîne asta bilind û temambûnê. Behaneya vê yekê ewe ku dema di qonaxa dawî da leşkerê xîlafetê biserket û bajarê Baz (Bez), paytextê şoreşê dagîr kir, dîtin ku hefthezar û şeşsed dîlên Misilmanan li ba wan hebûn, dîlên jin gova û şahid bûn ku *Babek* bi başî û qencî bi wan ra dida û distand.

Pir caran tabûrên leşkerê yên gewre û bi çekên giran ji ber şoreşgeran bazdidan. Ev leşkerên gewre bi rêveberiya kesayetiyên payebilind yên dewleta Ebbasî bûn, ji wan kesan, *Mihemmed Bin Humeyd El-Tûsî, Îsa Bin Mihemmed* û *Elî Bin Sedeqeh*. Yek ji şer û cengên here gewre di navbera şoreşgeran û leşkerên xîlafetê da, şerê çiyayê *Heştadser* di sala 214-ê gocî (829-ê z.) da bû ku heft kîlometran li rojhilatê bajarê Baz dikeve. Di vî şerî da, *Babek* li geliyan û paş hîm û zinaran kemîn amade kiribûn. Gava *Mihemmed Bin Humeyd El-Tûsî* bi leşkerên xwe va kete herêma şoreşê û berê xwe da keleha Baz, *Babek* û leşkerên xwe ji warên bilind da xwe berdane ser wan û kemîngeran jî ji paş va êriş wan kirin. Dijmin şikest û *Mihemmd El-Tûsî* di şer da hate kuştin(2).

## Qonaxa duwem:

Ev qonax ji sala 218-222-ê goçî (833 –837-ê z.) berdewam dike. Di vê demê da xelîfe *El-Mu'tesim* kurê *Harûn El-Reşîd* li ser text bû. Di vê qonaxê da leşkerê xîlafetê ji têkçûnan ber bi serkeftinan va çû. Yek ji şer û cengên here navdar, şerê bereya *Hemezan / Amedan* sala 218-ê goçî (833-ê z.) bû. Navê rêveberê *Xûramiyan* di vî şerî da *Narseh* bû. Dîroknas El-Teberî dibêje ku hejmara kuştiyên *Xûramiyan* gihîşte sedhezarî, ji bilî jin û zarokan. Yên ku man çûn herêma bin destê dewleta *Bîzanta* û li bakurê Kurdistanê hatin bicihkirin. Kurdên Kirmanc (Zaza, Dimilî) li herêma Dêrsimê û derdorên wê ji neviyên wan şoreşgerên *Xûramî* ne(3).

Wek encama biserketina leşkerên xîlafetê di bereya *Hemezanê* da, herêmên şoreşê tenha di Azerbeycanê da man. Leşkerên xîlafetê li dijî *Xûramiyan* di navbera salên 218-220-ê goçî (833-835-ê z.) da biserketin, pir kes ji wan kuştin, pir kes jî dîl girtin û dîlên Misilmanan rizgar kirin. Yek ji bûyerên here navdar yên vê qonaxê dîlkirina rêveber *Ismet Kurdî* bû. Sedem jî ew bû ku *Mihemmed Bin Be'îs*, xwediyê herdu kelehên *Tebrîz* û *Şahî* ji piştgirên *Babek* bû. Lê belê, piştî biserketina leşkerê xîlafetê di bereya *Hemezanê* da, xelîfe *El-Mu'tesim* bi nehînî

[1] Bernard Louis, Ereb di dîrokê da, rûpel 144. Huseyn Qasim El-Ezîz: El-Babekiye, rûpel 212 - 215.
[2] Ebu Henife El-Deynuri, Agahdariyê Dirêj, rûpel 403. El-Teberi, Dîroka El-Teberi, 8/622. Ibin El-Esîr: El-Kamel fî Tarîx, 5/560.
[3] El-teberi, Dîroka El-Teberi, 4/59. Ibin El-Esîr: El-Kamel fî Tarîx, 6/38.

jêra nivîsand û wisa alîkariya leşkerê xîlafetê kir. Û gava *Îsmet* di ba wî ra derbas bû û lê bû mêhvan, mey û şerab da wî heya ku mest û serxweş ket. Di pey ra ew girt, hinek ji leşkerên wî kuştin û ew wek dîl şande Bexdadê. Dîlkirina *Îsmet* ziyan û zirara here girîng ji bo şoreşê bû[(4)].

Di salên navbera 220-222-ê goçî (835-837-ê z.) da rêveberê leşkerê xîlafetê turkek bû bi navê *Efşîn*. Navê wî yê rastîn *Heyder Bin Kawûs* bû. Ev kes di destpêkê da kole bû û paşê bilind bû heya gihîşt asta rêveberên mezin. Dayîka xelîfe *El-Mu'tesim* jî cariyeka turk bû. *El-Mu'tesim* baweriya xwe bi Ereb û Farisan nedikir. Ji lewra, gelek koleyên Turk xistin nav leşkerê, *Efşîn* jî yek ji wan bû û di rêvebirina şer û cengan da jîrek bû. Gelek şer û ceng di navbera *Babek* û *Efşîn* da pêkhatin. *Babek* hin serkeftin pêkanîn, lê belê neçar ma ku paşva vekişe. *Babek* di şerê *Heştadser* yê duwem da sala 221-ê goçî (836-ê z.) zirar kir û yek ji rêberên leşkerên wî bi navê *Turxan* bi doxmanî (îxanetî) hate kuştin. Vê bûyerê bandoreka mezin li bereya şoreşgeran kir[(5)].

Di sala 222-ê goçî (836-ê z.) da şerekî girîng di navbera leşkerê *Babek* û leşkerê *Efşîn* da li ber çemê *Kilanroz*, li nêziya keleha Baz (Bez) pêkhat û leşkerê *Babek* bi sedema pozbilindiya rêveberekî wî yê bi navê *Azîn* (*Adîn*) têkçû ku girîngî neda leşkerê xîlafetê û guh neda fermanên *Babek* ku haydar be. Ji ber wê, rê li ber *Efşîn* vebû ku keleha Baz, nawenda *Bebek* û şoreşê dorpêç bike. Ev keleh li ser çiyayê *Qeredax*ê, li başûrê çemê Arasê ye[(6)].

Sedemên here berz ku leşkerê xîlafetê li dijî şoreşgeran biserket evin:

1- Şikestina bereya Hemezanê ku bi sedema wê Xûramiyên başûr ji yên bakur (Azerbeycan û derdorên wê) hatin birîn.

2- Jîrekiya *Efşîn* ya leşkerî û pilanên wî bi dirêjkirina şer û dorpêçkirina herêmên şoreşê, birîna xurdemenî û posatê ji ser wan û kuştin û dîlkirina rêveberên şoreşê yên dilsoz û payebilind.

3- Pêkanîna hin hêzên taybet bi navê *Gûhbanî* ku di şerên çiyayan da xwedî serborî bûn. Ji bilî anîna pir şervanên Turk ji herêmên *Ferxane* û *Eşrûsne* (Ozbekistan û Turkmanistana niha).

4- Biserketina *Xûramiyan* dihate wê maneyê ku xîlafet nîveka herêma serdariya xwe ya rojhilat zirar bike. Ji lewra, *El-Mu'tesim* hemû şiyanên daringî (madî) û manewî xistin xizmeta biserketina xwe li dijî şoreşê.

5- Kêmasî û texsîra gelek derebeg û tirsonekan ku xwe dan aliyê leşkerê xîlafetê û *Efşîn* jî gelek qelawûz û sîxur li herêmên şoreşê belav kirin; hem agahdarî digihandin wî û hem jî agahdariyên sexte û neyînî li dijî şoreşê belav dikirin.

6- *Babek* hevpeymanek li gel Qeyserê Romê *Theophile* li darxistibû. Dema leşkerê xîlafetê êriş anî bereya Azerbeycanê, *Babek* ji *Theophile* xwast ku bereyeka

[4] El-Teberi, Dîroka El-Teberi, 9/12.
[5] [5] Ebu Henife El-Deynuri, Agahdariyê Dirêj, rûpel 403. El-Teberi, Dîroka El-Teberi, 9/11, 28.
[6] El-Teberi, Dîroka El-Teberi, 9/29-30. Ibin El-Esîr: El-Kamel fî Tarîx, 6/24.

şer li dijî dewleta Ebbasî veke, da ku zor ji ser şoreşgeran kêm bibe. Lê belê *Theophile* ev daxwaz bi paş va xist heyanî ku şoreş têkçû[7].

Niha tenha ma ku em zanibin, dema piştî wê, dawiya *Babek* û ya şoreşê çawa bû?

[7] El-Teberi, Dîroka El-Teberi, 9/56. Huseyn Qasim El-Ezîz: El-Babekiye, rûpel 226.